



## **Australian Government**

### **Department of Health**

#### **Parazina civakê ji Vîrus a korona'yê (COVID-19)**

Here em ber bi jîyanek li gel COVIDSafe'ê diçin, gelek girînge hûn li mal bimînin heke hûn nexweş bin. Heke nîşanên serma û ên wek helmewtê li were hebîn divê hûn hewil bidin bo şîretên tenûrûstîyê ên di derheqa testa bo COVID-19. Kesên semptom/nîşanîyek sivik ji bi wan re hebe disa dikarin vîrusê belav bikin.

#### **Testkirin bo COVID-19**

Tespîya zû tê wê watê hûnê bikaribin pêşî li derbasîya belavûyîna vîrusê bo heval û malbata xwe bigrin.

Heke bi were ta/agir, kûxik, şewt a qirrikê, kurtahî ya bîhê, we gellek girîng be ku hûn biçin bo bêtin testkirin.

Testkirin hê wê girîngtir be heke hûn nexweş bin û :

- heke di nêzikî da hûn ji derva fetilî ne Australia. Hemû geştîyar piştî gihîştin Australia wê ji bo 14 rojan bêne karantînkirin.
- Heke hûn di nav 14 rojênê buhûrînde têkilîyek we ya nêzik li gel kesekî kû nexweşîya wan a COVID-19 hatîbe tespîtkirin çêbûbe
- lênêrê tenuristî bin, lênêrê temen mezinan bin, lênêrek di navmalê bin and karmendek birpîrsîyar kû têkilîyek rasterast li gel kesek nexweş çêbûbe.

#### **Ezê li ko karibim bêtme testkirin?**

Hûn dikarin pêwendî bi gel diktorên xwe bo azmûnek testekî an herin ba klinîka nefesê.

Heke hûn çûn ba diktor girînge kû berî herin pêwendî girê bidin û semtomên/nîşanên ji wan re bêjin.

Ev yeka wê fersend bide wan da ew ji amadeî bikin û kesên li nexweşxanê ji biparêzin dema hûn çûn wêderê. ther people at the clinic.

Klinîkên nefesê navendên tenduristîyê ne û li seranserê welêt bal û têna xwe didin testkirina kesên stemtoma enfekisyon/derbasker giran a nefesê biwan re heye. Bo klinîkek a nefesê ya nêzikî we, serdana [www.health.gov.au/covid19-clinics](http://www.health.gov.au/covid19-clinics). Li wîlayet û herêmên hûn lê dimîn di be kû hê zêdetir klinîkên bo testkirinê hebin. Hûn dikarin ewana bi rêya malperrên wîlayet û herêmên hûn lê diminin peyde

Heke we testa vê vîrusê kir divê pêwîste hûn li mala xwe bimin û ticar bira têkilîya we bi kesekî din re çênebet. Di be netîça tesê piştî rojek an heta dû rojan bigihîje desê we.

If you have serious symptoms such as difficulty breathing, you should call 000 for urgent medical attention. Hek semptomê/nişanek xidar wek dijwarîyek nefesê bi were çêbû divê hûn têlefona 000 ê bikin bo lînerina bijîjki a lezginê.

### **Yarmetî bo rawestandina belavbûyînê**

Bo paraziya civakan, divê herkes berdewam be bo pêkana dûrbûna fîzîkî û paqijîyek paqijîyek baş. Hewil bide ku hûn qasi 1.5 metran dûrî kesên din bin, û heke hûn nexweş bin ji li mala xwe bimin. Destê xwe bi av û sabûnê bişon û milên xwe bidin ber poz û devên xwe dema kûxîn û pişkînê. Em hemû dikarin di cîhê xwede diştê para me dikeve bikin bo sekinandina belavbûyînê a COVID-19.

### **COVIDSafe App'he daxînin**

Heke we heta neha COVIDSafe app danexistibe, daxînin û yarmetî bike bo paraziya malbat, heval û civaka xwe. Ev app pişgirîya karbidestên tenduristîya civakî dike da kû ew ji haydarî bidin ew kesên kû têkilîyên wan çêbûne bi ewên ku vîrus a korona bi wanre hebîye.

### **Agahdarîya zêde di derheqa COVID-19**

Ew yeka girînge kû hûn agahdar bin bi rêgehên çavkanîyên fermî. Serdan [www.australia.gov.au](http://www.australia.gov.au), bikin, an têlefona Xetalîkarîya Helpline on 1800 020 080 an ji pêwendî li gel xeta kargûzarîya wergerî û tercûmanî 131 450.